# Jîn

Jimara heştê | Heyva Kanuna Êkê 2006 | Vercinye, Emrîke | perê - 1

Em li ber dergehî yê cejina "Krismes"î ne. Erê Krismes çi lê ye? Dîarîya kirrînê? Stranêt Krismesî lêdanê? Xanîa u dara u beheşta xemilandinê? Cejina serê salê pîruzkirinê? Baba Nuêl?



Bi rastî Baba Nuêl nîne. Derbarê wî bixwîne: **www.stnicholascenter.org/Brix?pageID=35**.

Rast e zelamek hebî, navê wî "Nikoles" bî. U wî harî karîa hejar dikirin u pare da wan. Derbarê wî bixwîne: **www.stnicholascenter.org/Brix?pageID=38**.

Bila em li nav beyna kirrîna dîarîya u filan ji deykbîna 'Îsaî ji bîr nakîn. Dirist e kes nizanit kengî roja deykbîna 'Îsaî bî. 'Edetêt me dibêjit 25 bi heyva duzde ye. Rojê dirist ne pêtivî ye. Belê bîrhatinê 'Îsayê Mesîĥ pêtivî ye.

Derbarê mebesta rast ya Krismesî bixwîne: **www.christiananswers.net/christmas/home.html** (Tu dişêî filmek li ewê webseyt seĥ bikî. U tu jî dişêî çîroka rast ya deykbîna 'Îsaî li perê sîê li vê guvarê bixwînî.)



www.tnpsc.com

Mala me gelek ĥe ji Krismesî dikit! Ji berî 25 bi heyva duzde em diçîne derê da 'îbadeta Xwidê bikîn. Em stranêt deykbîna 'Îsayê dibêjîn u biçîk çîroka Mirîemê u Yusivî u 'Îsaî bi zarî vekin. Qeşê me beĥsa 'Îsayê Mesîĥ dikit.

Xemilandinêt xanîê me can in. Bu ĥemî heyva duzde nîşan u miruvêt dara li ĥedîqa me dimînin da cîranêt me ji bîr nakin eve deykbîna 'Îsayê ye.




li ĥedîqê mala me

Li roja Krismesî me çayê vedixwîn u hêka u "kêka cejinê" ya taybet bu têştê dixwîn. Ev "kêk"e bi rastî nanê darçînê yê grrovirr e u şemalkek tê da heye. Em şemalkê hil dikîn u strana "Happy Birthday" bu 'Îsaî dibêjîn.



kêka cejinê

(Seĥ kê perê pêncê da rêka çêkirna nanê darçînê fêr bî.)

Ji berî em dîarîyêt xu li roja Krismesî (25 bi heyva duzde) vedikîn, em çîroka deykbîna 'Îsayê ji Incîlî dixwînîn (wek çîroke li perê sîê li vê guvarê). Piştî hingê em du'a dikîn u supasîa Xwidê bu hinartina 'Îsaî dikîn da em dişêîn jîana her u her hebit. U paşî em dîarîyêt xu vedikîn. U keyfa me gelek têt.

Her dem mêhvan tên mala me u em pêk ve xwarinek 'elu'elu dixwîn. Mmmm… çend xuş e!

"Jîn" guvareke têtе nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com
© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Azadîa rastî çi ye?

Rast e “azadîa rastî” çi ye? Heker me zanî ba dê me jîana her u her hebit, belê ew dê azadîa rastî bit!

Belê mebesta rast ya Krismesî derbarê dîarîya ye. Jîana her u her dîarîyek e ji destê Xwidê têt. Bila em seḧkînê dîarîyêt Xwidê u em ji bîr ne kîn.

## Dîarî

**Dîarîya êkê – jîan.** Xwidê jîan daî me – Xwidê em çêkirîn. U çawa lê hat? Li destpêkê Xwidê bi Peyvê xu axift (ferman da) u cîhan çêkir.

**Dîarîya dûê – pêx̌ember.** Xwidê zelam wek Musa u Îbrahîm dan vî şulî: peyvê Xwidê bidin miruva da pîa Xwidê bikin u bijîn.

**Dîarîya sîê – ‘Îsa.** Çunku Xwidê ḧe ji me dikit, dîarîyekê gelek mezin daî me. Xwidê ‘Îsa bu me hinart! Tijî sala ji berî Xwidê ‘Îsa Pêx̌ember hinarte cîhanê, deykbîna wî hat pêx̌emberatî kirin.

‘Îsa taybet e u me çi car wek pêx̌emberek dî ne dîtî ye. Ew dîarîe ji Xwidê **bu ḧemî cîhanê ye**, ne bi tinê bu êk milletê.

(1) Deyka ‘Îsaî kiça kiçîn bî.

(2) Cihê deykbîna ‘Îsaî pêx̌emberatî bi rê ve bir u Xwidê li bajêrê Beytleḧim (bajêrê Daûd Paşayî) da.

(3) Tijî frîşteyêt Xwidê deykbîna ‘Îsaî ragehand: gut deyka wî u mêrê wê u hindek şivana.

(4) Stêra ‘Îsaî hindek stêrnas ji rojhelatê înan mala wî da wan şîan ‘îbadeta wî bikin. (Çîrokê li perê sîê li vê guvarê bixwîne.)

U buçî ‘Îsa bî miruvek u hat li gel me? Da me azad bikit u da me dê runahîya rast hebit.

> “Gîanê Xudanê rêzdar li ser min bit, çunku Xudanî ez çewir kirim, da mizgînîê bidime belingaza, ez hinartim da brînêt dil şikestîya bigirêdim, da daxwaza berdana zîndanîa bikim u yêt jêrdest jî bi azadîê, da destura Xudanî ya wergirtî rabigehînim, u roja tol vekirnê bu Xudayê me, da xema dilê wan ez hilgirim.” (pêx̌emberatîa Eş’îyaî)

**Dîarîya çarê – jîana her u her.** Belê em u ew miruve Xwidê li destpêkê çêkirîn pîa Xwidê ne kirî ne u ji ber hindê ji Xwidê dîr kirî ne - bi gîanî mirin u dîmahîê bi leşî mirin. Belê Xwidê divêt miruv li gel wî bin (ye’nî sax) u ne vêt miruv jê dîrkirin (ye’nî mirî). Xwidê divêt em li gel wî her u her bijîn.

‘Îsa jîan e! ‘Îsa hat da ewêt ku bawerî bi navê wî înaîn, maf da wan bibine biçîkêt Xwidê. Bi rêka ‘Îsaî Xwidê tarîya me dikite runahî.

Em ber çakîê Xwidê u bi bawerîê qurtal dibin u ne bi kirîarîêt xu. Heker em qebîl bikîn ew dîarîe ji Xwidê (yê ‘Îsa) u bawerîê pê bînîn, belê dê bu me jîana her u her bit. U piştî leşêt me dimirin, em dê her u her li gel Xwidê mînîn.

U ewe azadîa rastî ye.

“Belê rêzdar bi Xwidê nîşanekê dite we: Eha **ya kiç avis dibit** u **dê kurrekê înit** u dê **navê wî kite ‘Emanuîl**. … **Dê bu me kurrek hebit** u dê kurrekî dite me, barê serukayetîê li ser milê xu ragirt. U navê wî dê <Seyr> bit, <Rawêjker> bit, <Xwidêyekî bi Şîan> bit, <Babekî Hetahetayî> bit, <Serukê Aştîê> ye, u nabite dîmahîkek bu gejbîna serukayetîya wî u aştîê jî.” - pêx̌emberatîa Eş’îyaî

“Belê tu ey **Beytleḧim**a Efirate. Her çende tu ya biçîk î dinav gundêt Yehuda. Belê dê bu min êk ji nav te derkevit u dê bite paşayê Îsraîl u binîatê wî yê kevin e u ji berî hemî tiştî ye u **çi destpêk bu nîne**.” - pêx̌emberatîa Mîxaî

“Eve ezê mizgînîya dilxuşîeka mezin di dime we u dê bite dilxuşîa gelê we ḧemîê. Evru li bajêrê Daûdî **Qurtalker**ek bu we yê ji deyk bî ye, ew jî **Mesîḧ**ê Xudan e. Eve jî nîşana wî ye: Biçîkekê dinav pata da pêçaî u di hafrî da nivîstî ye. … Mezinatî li bilindîa bu Xudaî u aştî li ser ‘erdî bu miruva u dilxuşîa Xwidê lê.” - Ragehandina firîşteyêt Xwidê bu şivana

Jîn

Jimara heştê Heyva Kanuna Êkê 2006 Vercinye, Emrîke 

# Deykbîna ‘Îsayê Mesîḧ

Eve ye ka çawa ‘Îsayê Mesîḧ hatî ye dinyayê: Deyka wî Merîem ya bu Yusivî meherkirî bî. Ji berî ku ew her dû bigehine êk, hate dîtin, ku Merîem ya ji Gîanê Pîruz bi tişt e. Belê çunku Yusivê dezgirê wê miruvekê rast bî u ne divîa hetka wê bibit, îna brîar da bi dizîkî ve ber bidit. Belê demê hizir di vê çendê da kirî, frîştekê Xudanî bu wî di xewnê da dîar bî u gutê: “Yusivê




kurrê Daûdî, tu ji hindê ne tirse, ku Mirîemê wek jina xu bibîe mal, çunku ewê di zikê wê da ji Gîanê Pîruz e. Dê wê kurrek bit u dê navê wî kite ‘Îsa, çunku ew dê milletê xu ji gunnehêt wan qurtal kit.” Eve hemî hate ruîdan da ewa Xudanî li ser zimanê pêẍemberî gutî bi cih bêt: **<Dê kiça kiçîn bi tişt kevit u kurrek dê bit u dê bêjinê ‘Emanuîl>** u ramana vî navî dê bit jî: “Xwidê digel me ye”. Demê Yusiv ji xew rabî, wî ew kir ya frîştê Xudanî fermana wî kirî u Merîem weku jina xu bire mal. Belê ew ne çû nivîna wê heta kurrek bî u navê wî kire ‘Îsa.



### Seredana Stêrnasa


Piştî ‘Îsa li Beytleḧim peyda bî li devera Yehudîê li serdemê paşa Hîrudêsî, hindek stêrnas ji layê rojhelatê ve hatine Urşelîm u pisîar kirin: “Kanê ye Paşayê Cihîya yê ji deyk bî? Çunku me stêra wî li rojhelatê dît, vêca em yêt hatîn xu bu biçemînîn.” Demê Hîrudês Paşaî eve guh lê bî ew u hemî xelkê Urşelîmê têk çûn. Îna wî hemî serukêt qeşêt Cihîya digel mamostayêt desturî kûmkirin u jê pirsî: “Mesîḧ dê li kîrê ji deyk bit?” Îna wan bersiv da u gut: “Li Beytleḧim li Yehudîê, çunku husa ya li ser zimanê pêẍemberî hatî ye nivîsîn: <U tu ey Beytleḧima> li devera Yehuda, <Qet li nav serukêt Yehuda ne ya kêm î, çunku dê ji nav te serukê çavdêrîê li xelkê Îsraîlê dikit derkevit.> Paşî Hîrudêsî bi dizîkî ve gazî kire stêrnasa u demê dîarbîna stêrê ji wan pirsî. Paşî virêkirne Beytleḧim u gut: “Herin u baş li zarokî bigerin u demê hîn dibînin bêjine min da ez jî xu bu biçemînim.” Demê wan guh daî ye paşaî, ew bi rê ketin u ew stêra wan berî hingî li rojhelatê dîtî li pêşîya wan diçû heta li hindav wî cihî zarok lê rawesta. Demê wan stêr dîtî gelek u gelek keyf xuş bîn. U demê bi jur ketîn wan zarok digel deyka wî Merîemê dît u wan xu bu çemand, paşî tuîrkêt xu



vekirin u xelatêt zêrî u bêhinêt bixwîrê u murî pêşkêşî wî kirin. U ji ber ku di xewnê da hatine agehdar kirin ne zivirine ve Hîrudêsî, ew di rêkeka dî ra berev welatê xu vegerrîane ve.

### Revîn Berev Misrê

Demê stêrnas çûîn, frîştekê Xudanî di xewnê da bu Yusivî dîar bî u gutê: “Rabe u zarokî u deyka wî birevîne Misrê u li wêrê bimîne heta ez dibêjime te, çunku Hîrudês dê li zarokî gerît da bikujit.” Vêca Yusiv di wê şevê da rabî u zarok u



deyka wî berev Misrê ve birin. Li wêrê man heta mirna Hîrudêsî, da ewa Xudanî gutî li ser zimanê pêẍemberî bi cih bêt: <Min kurrê xu ji Misrê gazî kir.> Demê Hîrudêsî zanî stêrnasa tirane pê kirin, gelek turre bî u ferman da hemî kurrkêt Beytleḧim u dewir u berêt wê yêt ji dû salîê biçîktir bikujin, li dîv demê dîarbîna stêrê herweku ji stêrnasa zanî. Hingî ew peyva bi zimanê ermîya pêẍember hatî ye gutin bi cih hat: <Dengek ji Rame hate guh lê bîn, hewar u nalîneka tîj! Raḧêl bu kurrêt xu dikite girî u razî nabit dilê wê bête xuş kirin, çunku ew êdî ne man.>

### Vegerrîan ji Misrê

Piştî Hîrudês mirî, frîştekê Xudanî di xewna Yusivî da li Misrê dîar bî u gutê: “Rabe zarokî u deyka wî bizivirrîne ve devera Îsraîlê, çunku ewêt hewildaîn wî bikujin yêt mirîn!” Vêca rabî zarok u deyka wî vegerandine devera Îsraîlê. Belê demê guh lê bî, ku Erxîlaûs yê desthelatîê li ser devera Yehudîê şuîna babê xu Hîrudêsî dikit, tirsîa biçite wêrê u ji ber ku di xewnê da hate agehdar kirin, vêca çû devera Celîl u gehişte bajêrê digutinê “Nasîre” u li wêrê xu cih bî, da ewa hatî ye gutin li ser zimanê pêẍembera bi cih bêt: “Dê bêjinê yê Nasirî.”

- ji Mizgînîa Mettî 1:18-2:23

“Jîn” guvareke têtê nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Îmêlêt We

Xoşka ya beriz, Şirîn.

Ez zorr supasîa we dikim ku hîn vê guvarê bu min virêdikin her heyv. Bawer bike her hevalek min hebit min bu yê virêkirî.

Carek dî zorr supas bu te.

Birayê we,

Î.Z.

Silav.

Min xwand. Supas. Ez dê bu hevalêt xu virêkim.

M.R.

Silav.

Çawan î? Hîvîdar im tu baş î. Em ji te xerîb bîn. U hîvîa Xwidê em dê êk u dû bînîn.

Em hizirêt xu dikîn ku tu her dem li gel me çunku tu van guvara bu me virêkî. Ez nizanim çawa supasîa te kim.

Zorr supas, xoşka me ya mezin. Jîana te xuş bît! Hîvîdar im seḧeta te baş bit.

H.J.H.

Supas! Ev gelek baş e! ☺

Ser xêrê bit!

G.S.

Bibure ez nakim, çunku ez Kurd im, ez ne Emrîkî me. Tu çima beḧsa cejina remezana pîruz nakeî?

B.R.

> Silav! U cejina te (Remezan) pîruz bit!
>
> Rast e, tu ne Emrîkî, belê hindek hevalêt min yêt Kurd Emrîkî ne u li Emrîke dijîn u ḧe ji Roja Supasîê dikin. U ji ber hindê min beḧsa Roja Supasîê kir – da hîn ḧemî ‘edet u mejua Emrîke fêr bibin u da hîn ḧemî bizanin çawa welatê Emrîke dest pê kir … u çawa demokrasî jî li Emrîke dest pê kir …
>
> Xoşka te,
>
> Şirîn

Silav, Şirîn.

Çawan î? Hevalêt te çawan in? “Jîn” jimara 7 geheştî ye. Supas. Min gut hevalêt xu. “Jîn” bu hevalêt min virêke: 1__@yahoo.com; 2__@yahoo.com.

S.N.

Silav, Şirîn.

Şulê te gelek baş e. Min guh li te bî ji hevalê xu A. ji Zaxo. Wî guvarekê “Jîn” nîşa min kir u keyfa min hat. Supas bu wextê tu “Jîn” dinvîsî.

A.


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Jîn



## Rêka Çêkirna Nanê Darçînê



(1) Bi kefçika darî di legena mezin da têk ve de:
- ½ kûpa ava gerim
- 2 kefçikêt hevîr tirrşî
- 1 kefçika şekirê


1, 2

(2) Bihêle ȟeta 10 deqîqa. U paşî bike ser:
- 1½ kûpa şîrê gerim
- ½ kupa şekirê
- 2 kefçikêt çayê xwê
- 2 hêka
- ½ kupa nîvişkî
- 7 ȟeta 8 kupêt arî




3

(3) Têkilî êk u dû bike. U dîv da ji legenê bîne derê u deyne li ser neylunekê. Piçek arî pê wer ke da pê ve ne mînit. Bi her dû desta 5 deqîqa hevîr bike ser neylunê. Tu dişêî piçek arî li gel destêt xu u hevîrê xu bikî.


5

(4) Li legena xu piçek zeytê bide. Dîv da hevîrê xu bike tê da. Bi destê xu li hevîrê xu piçek zeyt bide.

(5) Bi sifirekekê terr binxêve. Deyne cihekê gerim.


8

(6) Piştî se'etekê ȟeta dû se'eta hevîrê xu bîne derê u deyne ser cihekê rast ser neylunê.

(7) Bi tîrka hevîrî piçekê peȟin ke. Hevîrê te bila piçekê stîr bit (1 ȟeta 2 santîmetra).

(8) Nîvişkê nerim li hevîrê xu bide.


9

(9) Li legenekê biçîk hindek darçînê u şekirê pêk ve têkil êk bike. Wê têkilê ya darçînê u şekirê bi kefçikê li hevîrê xu bireşîne.


10

(10) Hevîrê xu ba de u grrovirr ke ser drêjîê.

(11) Sênîkekê asin yan cam zeyt bike u wî hevîrî bike tê da bi şiklê 'ewilî yan bi şiklê dûê:

(a) Hevîrê badaî deyne li ser sênîkê wek grrovirrekê.

(b) Her 2 yan 3 santîmetira hevîrê xu qet ke wek êk u dû.


11a


11b


12

(12) Bi sifirekekê terr binxêve. Deyne cihekê gerim.

(13) Wextê hevîr tirrij bî ye (piştî 30 ȟeta 45 deqîqa) hevîrê xu bike di firnê da bu 25 deqîqa.


13



Germatîa firnê li Emrîke 375° (F) ye
u li Kurdistanê u li Ewrope 190° (S) ye.

(14) Bixu gerim. Xuş e! U 'afîed bit!


13





"Jîn" rujnameke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara rujina bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Jîn

Jimara heştê | Heyva Kanuna Êkê 2006 | Vercinye, Emrîke | perê – 6


## Peyvêt Kurdî Berambera Inglîzî: Cejina Deykbîna ‘Îsaî

### BERAMBERÊ →

**1** “Xwidê digel me ye”
**3** ‘Emanuîl
**8** xizîne (f)
**9** îbadet kirin,
‘îbadetê bike /
xu bu çemandin,
xu bu biçemîne
**10** zêrr
**12** Kurrê Daûdî
**13** bêhinêt bixwîrê
**16** xelat (m)
**17** şivan
**18** Paşa Hîrudês
**19** firîşte
**21** sunetkirin (f)
**25** Nasîre
**28** stêr (f)
**29** Misir
**31** Beytleḧim
**32** Uẍistus Qeyserî
**33** Yusiv


### XWARÊ ↓

**2** Gîanê Pîruz
**4** stêrnas
**5** rojhelat (m)
**6** Mesîḧ
**7** mizgînî
**11** kiça kiçîn
**12** ji gunneha qurtal kirin,
ji gunneha qurtal bike
**14** xewn
**15** revîn, birreve
**20** Paşayê Cihîya
**22** serjimêr (f)
**23** tuîrik
**24** cejina deykbîna ‘Îsaî
**26** Mirîem
**27** mur (f)
**30** ‘Îsa

# Christmas



www.coptic.net




*[Bersiva vê Beramberê li guvara meha bêt dê ête belav kirin.]*


“Jîn” rujnameke têtê nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara rujina bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

ji meha burî:

# Roja Supasîa



## Thanksgiving












© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Zanîarîêt Pêtivî bu “Texmînê Bike!”

Ev yarîe yarîa wêne çêkirnê ye. Ȟemî kes dişên vê yarîê bikin. Dû miruv yan sê miruv yan her jimareka hebit. Herwesa tu dişêî wekî tîma yarîa bikî. Li destpêkê da pêtivî ye tu van karta jêk cida bikî. Van karta bi meqesê qet ke. Piştî qetkirna her perrekê dê te neh karte hebin.

**Texmînê Bike!**
© 2006 by Şirîn
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

KÎ? (miruv)
*Who? (people)*

KÎVE? (cih)
*Where? (location)*

ÇI? (tişt)
*What? (something)*

ÇAWA? (bizav)
*How? (action)*

BUÇÎ? (ȟemî tişt)
*Why? (miscellaneous)*

## Destpêka Yarîê

Ew kesê kartê di destî da (ewê kartê hildigirit), pêtivî ye ew kesê dî yêt tîma wî nezanin çi li ser kartê ye. Demê tu seȟ dikî kartê babetekê (Kî? Kîve? Çi? Çawa? Buçî?) hilbijêre ku ew babeta tu dê wêne çêkî bu tîma xu. U çênabit tu biaxivî. Bes wênê çêke. Belê tîma te hewl didin bizanin ew wênê ya çi ye. (Babetê texmîn bike!) Belê hevberê te jî dê rengî tiştî çêkit ewê we hilbijartî. U dê wênê bu tîma xu wêne kit. U ew kesê yan tîmê bizanit ew wênê ye ya çi ye, ew dê pile wer girit.

◀ Karta ewilî (ji heyva burî) naête bi kar înan, belê taybete bu nimune da tu bizanî babetêt di yarîê çi ne:

Kî? = bu wênêt miruva diête bi kar înan

Kîve? = bu wênêt ciha yan bajêra diête bi kar înan

Çi? = bu wênêt tişta diête bi kar înan

Çawa? = bu wênêt bizavkirnê yan bizavkirna diête bi kar înan

Buçî? = bu wênêt ȟemî karêt zeȟmet yan qurs diête bi kar înan

Karta dûê (ji heyva burî) wekî evê çende ye: ▶

Ew kesê karte di destî da brîyarê dit, êk ji van babeta hilbijêrit. Bu nimune Çi? se’et, belê **çênabit tu hevberî xu agehdar kî yan bêjîê te çi hilbijartî ye**. Belê pêtivî ye tu bêjîe çi babete wekî “Çi?” yan “tişt” ku da bizanit babetê wî çi ye.

Piştî te babet hilbijartî, u te gute hevberî xu babete çi ye (Kî? Kîve? Çi? Çawa? yan Buçî?), dest bi çêkirna wênê bike. **U çênabit ebet biaxivit**, ew kesê karte di destî da u wênê çêkdikit.

Li vî demî hevberê te bizavêt dikit da bizanit ka wênê çi ye ewê tu çê dikî. Dest bi axiftinê bike u mebesta wî ewe: bizanit ew tu çi çêdikî. U ew kesê wênê çêkdikit pêtivî ye wênekî ku hevberê wî bizanit ew wênê ye çi ye.

Ev karê he herwesa diête kar înan bu yarîa tîma. Belê pêtivî ye ew kesê li êk tîmê da wênêt wek êk dirist bikin da êt beramberî wana bizanin ew wênê ye çi ye.

Ev yarîe gelek xuş e u her kesêk dişêt vê yarîa bikit. Belê xuştir e dibit heker pitir ji çar kesa yarîa bikin.

Ew kesê me’na yan qesa (bi nimune “se’et”) hilbijêrit yan bizanit, ew kese dê pileyekê wergirit, yan tîma wî pilê wergirit. U ew dest bi yarîê dikit.

**Texmînê Bike!**
© 2006 by Şirîn
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

êxtîar
*elderly*

bend
*water*

se’et
*clock (f)*

dan, bide
*give (v)*

cil u berg
*clothes and accessories*

Yarîekî xuş burîne!☺



© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Corc Buş — *George Bush (president of the U.S.A.)*
- Dîyarbekir — *Diyarbakir (city in Turkey)*
- memkê biçîka — *baby bottle*
- lê pirsîn, lê bipirse — *interview (v)*
- birinc u savar — *rice and cracked wheat*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Aĥmedê Xanê — *Ahmade Khanay (poet)*
- Xabîrê Firat — *Euphrates River*
- kemputer — *computer (f)*
- xwandin, bixwîne — *read (v)*
- bîanî — *foreign*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- zelam — *male*
- Hewlêr — *Erbil*
- kitk u mişk — *cat and mouse*
- telefun girtin, telefunê bigire — *hang up the telephone (v)*
- tam — *taste*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- têgeheştî — *intelligent*
- Baẍda — *Baghdad*
- de’we — *invitation*
- gijluk hatin, gijluk bê (were) — *hail (v)*
- Cejina deykîna ‘Îsaî — *Christmas*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- bi ĥal — *pregnant*
- Amedî — *Amediya (city built on a plateau)*
- meẍreb — *dusk (f)*
- paqij kirin, paqij bike — *clean (v)*
- êkşemb — *Sunday (f)*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- bi sitar — *conservative*
- Drîm Sitî — *Dream City (amusement park in Dohuk)*
- giran — *heavy*
- firutin, bifiruşe — *sell (v)*
- kezîk — *braid*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- xesusî — *private*
- Endîwer — *Andeewar (city in Syria)*
- ĥilî — *smooth*
- serif kirin, serif bike — *change / exchange money (v)*
- kotilk u îprax — *meat patties and stuffed vegetables*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- zêngîn — *rich (people)*
- Silêmanî — *Suleymania*
- KDP — *Kurdish Democratic Party of Kurdistan*
- kirrîn, bikirre — *buy (v)*
- nuqî — *underwater*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- esle’ — *bald*
- Kwêt — *Kuwait*
- kefçik u çetal — *spoon and fork*
- bi deyn dan, bi deyn bide — *lend (v)*
- teĥînî — *beige*

# Deyk u Biçîka We

Ev maȟfîre ji sîkê Dihukê, 2003.




© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.